# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar :841 24-Sibat- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî



Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165


## Ji bo pêşbirka kurteçîrokan ciwan xwe amade dikin

**Ronahî/Qamişlo**

Bi armanca piştgirî û xurtkirina ciwanên xwedîhuner, Desteya Ciwanan û Werzişê bi piştgirya Ofîsa Lêkolîn û Xwendinê, cara yekê ye pêşbirka kurteçîrokan li dar dixe.

Ji bo tevlîbûna pêşbirkê qeydkirina navan wê heta 25`ê mehê dewam bike. Pêşbirik 27ê Sibatê saet 10an li Navenda Çandê ya bajar Amûdê dest pê dike. Di pêşbirkê de wê li sê kesên serkeftî diyarî werin belavkirin.

Şert û mercên tevlîbûnê ev in: "Divê temenê beşdar di navbera 15-35an de be. Divê kurteçîrok bi zimanê Erebî be û bi ser 500 gotinî nekeve. Kesên dixwazin beşdar bibin dikarin bi li ser vê reqemê 0932217616 xwe bigihînin desteyê.







## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | S | O | R | ■ | M | E | D | ■ | |
| 2 | Î | ■ | Ê | D | Î | ■ | O | F | ■ |
| 3 | ■ | E | B | A | ■ | M | ■ | A | A |
| 4 | E | ■ | E | ■ | X | A | L | ■ | R |
| 5 | T | Î | R | M | E | H | ■ | A | D |
| 6 | Ê | M | ■ | E | ■ | T | Î | P | ■ |
| 7 | ■ | H | E | W | Î | ■ | S | ■ | Z |
| 8 | X | A | N | Î | ■ | N | A | M | E |
| 9 | W | ■ | E | J | N | Û | ■ | Û | R |

## Xaçepirs



### ÇEP-RAST

1. Kurteya elementa Aktînyûmê... Kesê libat û tevgerên wî ji adetê der in
2. Îman... Yezdanekî misrî
3. Îşaret, şop... Notayek
4. Cilê nêçîrê... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê
5. Ji bo ajotina keran tê gotin... Kurê zarokê mirovekî
6. Keleşêr
7. Teref... Cureyekî xwînê
8. Notayek... Cihê ku lê li nexweşan tê nêrîn
9. Temen... Xweliya piştî şewatê

### JOR-JÊR

1. Cihê herî kûr yê okyanûsan û devera ku tîrêjên rojê nagihîjinê... Karker
2. Serbest, ne kole... Cama mîkroskopê
3. Bi soranî 'av'... Şerm
4. Beşa bijîşkiyê ya bi emeliyê nexweşên xwe tedawî dike
5. Ji bo denglêkirina li kesê kal
6. (Qesra …) Bi vê peymanê welatê Kurdan bû du parçe... Jin yan jî mêrê ku hemsera/ê wî/wê miriye
7. Baneşaneke gazîkirinê... Peyva neyînî
8. Plakaya navneteweyî ya Tirkiyê... Vexwarina sereke... Tiştê ku tama wî tehlokî, tirşokî û qemitokî
9. Pirtûka ku tê de rê û qanûnên dînekî hene... Pirsek di rewşa ne tewandî de

## Di Hiqûqa Herêmî û Navneteweyî de Mafê Perwerdeya Bi Zimanê dayîkê





**Leylan RESO/Qamişlo**

Bi pêmana Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê û bi durişma "Perwerdeya Bi Zimanê Dayîkê Mafê Bingehî yê Her Gelî ye", li Qamişlo komxebatek hat lidarxistin.

Komxebatê, seat 10an li Hola Efrînê ya Qamişlo, bi tevlîbûna saziyên Rêveberiya Xweser û welatiyan dest pê kir.

Di civînê de hevseroka Desteya Perwerdeyê Kewser Doko, got ez Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê li tevayiya çînên civakê pîroz dikim û diyar kir ku qonaxa heyî ya bi pêşengiya Kurdan wê ji bo qonaxeke nû bibe pirek.

Axaftvanan bal kişand ser du xalan. Xala yekê; Di Hiqûqa Herêmî û Navneteweyî de Mafê Perwerdeya Bi Zimanê dayîkê. Xala duduyan; Di Sîstema Bakur û Rojhilatê Sûriyê de Perwerdeya Pirzimanî û Pirçandî.



Derbarê mijarê de hevseroka Desteya Perwerdeyê ya Herêma Cizîrê Rohat Xelîl jî ev nirxandin kir: "Ev komxebat, bi pêmana 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê û ji bo girîngiya vê rojê ji bo gelê Kurd, Ereb û Suryan hat lidarxistin. Rêveberiya Xweser mafê her kesî daye ku perwerdeya xwe bi zimanê xwe bibîne. Ev roj ji me re pir girîng e. Heta niha xwendekarên me perwerdeya xwe bi zimanê xwe dibînin. Xwendekarê bi zimanê xwe perwerdeyê bibîne, hem afrînerî pê re çêdibe, hem xwe baştir tîne ziman, hem civaka xwe nas dike. Ji ber wê banga me ji aliyên pêwendîdar re heye ku nasnameya vî gelî qebûl bikin."

## Quncika Têgînan

| Bertek | Derketina li hemberê tiştekî, nerazîbûn: Li hemberî kiryarên wî bertek nîşan da. |
|---|---|
| Şênî | Yên li ciyekî ava dijîn: Şêniyên gund cejin pîroz dikirin. |
| Şênber | Tiştên ku mirov dikare destê xwe bide wan û bibîne. Melmûs: Weke kevir, av, dar… |
| Razber | Tiştên nayên girtin û dîtin. Tersê şênber: Weke heskirin, xemgînî… |
| Guncaw | Tişta bi kêr tê. Mûnasib: |
| Pêman/pêwan | Wesîle: Bi pêmana salvegerê şahiyek hat lidarxistin. |
| Hişmendî | Têgihîştin, zêhniyet: Hişmendiya wî ya derbarê jinan de ne rast e. |
| Vegirtin | Standina erdekî, milkekî bi darê zorê ji kesekî. Dagîrkirin: Welatê me vegirtin. Wateyên wê yên din jî hene. |
| Bişaftin | Helîna hêdî hêdî: Kevaniyê keşk bişaftin û dewê wan berda ser xwarinê. Herwiha bi mecazî tê wateya asîmîlebûnê jî: Civaka ne azad be tê bişaftin. |
| Bîrdozî | Koma fikrên ku di warê siyasî, hiqûqî, zanistî, felsefî û dînî de rê didin ber tevgerên komekê, partiyekê, yan rêveberiyekê. Îdeoloî. |

## Dîlgirtîyên di zindana Hewlêrê de dest bi greva birçîbûnê kirin

5 rojnamevan û aktivîstên Behdîna ku ji aliyê PDK`ê ve hatine girtin û 6 sal ceza li wan hatiye birîn, di girtîgeha Hewlêrê de dest bi greva birçîbûnê kirin. *R-2*





# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 841 24-Sibat- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## 'Gerîlayên jin li her deverê pêşengên şer bûn'

Fermandar Hêjar Zozan got, "Çalakiyên YJA Starê ne tenê li Heftanînê bûn. Li Xerzanê, Botanê, Zagrosê û gelek cihên din hevalê jin bi xurtî tevlî çalakiyan bûn. Ji aliyê profesyonelbûna hevalên jin ve îsal pêngavên gelekî cuda yên taktîkî pêş ketin."*R-3*



# Kujer dewleta tirkî ye




" Xema nexwe, rêxistina me ya sereke li Tirkiyê ye, fermandarên me hemû li Tirkiyê ne, biryar û ferman û destek hemû ji wir tên. Eger tu werî eşkerekirin emê te birevînin Tirkiyê û wê maleke te li wir hebe."



Îsmaîl Hakki Pekîn bi vê gotinê li komkujiya Parîsê mikur hat; "Li Ewropa jî rêveberên wan hene. Divê em tiştekî bînin serê yên li Ewropa. Yanî berê li Parîsê hatibû kirin, belê..."



## Siyasetmedar: Divê ENKS dewleta tirkî dewleteke dagîrker bi nav bike

Siyasetmedarên Kurd yên Rojava gotin, divê ENKS dewleta tirkî dewleteke dagîrker bi nav bike, da ji bo yekîtiya neteweyî ya kurdî gav werin avêtin. *R-4*



## Kujerê Seida û Hindê: Tirkiye destekê dide me

Kujerê Seida El-Hermas û Hind El-Xidêr hûrguliyên vî sûcî eşkere kirin û diyar kir ku deweleta tirkî destekê dide wan. *R-5*



## Kongreya Star dema çalakiyên 8`ê Adarê eşkere kir

Remziya Mihemed dema bernameya çalakiyên 8`ê Adarê eşkere kir û got; "çalakiyên 8'ê Adarê wê di çarçoveya qonaxa 2. ya pêngava 'Na ji dagîrkirî û qirkirinê re, bi hev re em jin û jiyanê biparêzin' de werin lidarxistin." *R-33*

## Hunermend çanda me diparêzin



Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê 20ê Sibata 2021ê li Navenda Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo ji bo keda hunremend Faris Bavê Fîras ya bi salan di warê hunera Kurdî de, şahiya xelatkirinê li dar xist. *R-7*

## "Serkeftina Garê serkeftina Kurdistanê ye"

Ji 10ê Sibatê ve dewleta tirkî ya dagîrker êrişî çiyayê Garê dike. Gelo armanc ji van êrişan çi ye? Piştî şkandina dewleta tirkî di Garê de, wê çi planên nû hebin? Dewleta tirkî her tim gelê Kurd dike hedef, ji bo têkbirina planên dewleta tirkî, divê gelê Kurd çi bike? *R-4*



# Dîlgirtîyên di zindana Hewlêrê de dest bi greva birçîbûnê kirin

5 rojnamevan û aktivîstên Behdîna ku ji aliyê PDK`ê ve hatine girtin û 6 sal ceza li wan hatiye birîn, di girtîgeha Hewlêrê de dest bi greva birçîbûnê kirin.




Her 5 rojnamevan û aktîvîstên Behdîna ku berî 6 mehan ji aliyê asayişa PDK`ê ve hatibûn dîlgirtin, Dadgeha Hewlêrê 16'ê Sibatê 6 sal cezayê girtîgehê li wan birî.
Navên rojnamevênên li girtîgehê wiha ne:
Şêrwan Şêrwanî, Umêd Seîd, Guhdar Zêbarî, Eyaz Kerem û Harîwan Îsa
Li gorî ajansa Rojnews'ê ku agahiyên xwe dispêre çavkaniyeke taybet, roja Şemiyê her 5 girtiyên ji Behdîna, li dijî xirabiya cih, xwarin, danûstandina xirab ya berpirsên girtîgehê û zextên derûnî dest bi greva birçîbûnê kirine.

# Kujerê Şehed Hatim hat girtin




Hêzên Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê ragihand ku qatilê Şehed Hatim El-Hac ya zarok, li bajarê Reqa girtine û diyar kir ku piştî lêpirsînê wê hûrguliyên sûc eşkere bikin.

Hêzên Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê li ser mijarê daxuyaniyek weşand.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin: "Li ser medya civakî nûçeyên sûcê kuştina zaroka bi navê Şehed Hatim El-Hac belav bûbûn. Derbarê vî sûcî de agahiyên ne rast hatibûn parvekirin ku li ser kuştin û fitneyê teşwîq dikin. Piştî 24 saetan li ser revandina zarok, hêzên me yên di têkoşîna li dijî sûcan de qatil girtin. Lêpirsîn dewam dike. Piştî lêpirsînê emê encamên wê ji raya giştî re ragihînin û sûcdar bişînin dadgehê.
Em Hêzên Ewlekariya Hundir ya Herêma Reqa tevî astengiyan parastina welatiyan û mîsogerkirina maf û milkên wan didomînin. Em soza pêkanîna ewleyî û aramiya herêmên me dubare dikin."
*ANHA*

# 105 malbat ji kampa Holê derketin



Li gorî biryara Rêveberiya Xweser ku koçberên bakur û rojhilatê Sûriyê vegerînin bajarên wan, 105 malbat ji bajarê Minbicê ji kampa Holê derketin.

Kampa Holê mezintirîn kampên li herêmên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilata Sûriyê ye. Herwiha yek ji kampên herî xeternak li cîhanê ye. Lewre bi hezaran malbatên çeteyên DAIŞ'ê lê dimînin.
Beşa 9an ya ku 28'ê Çileya borî ji kampê derketiye, ji 67 malbatan; 236 kesan pêk dihat. Piraniya wan jin û zarok bûn û ji bajarê Minbicê bûn.
Ev li gorî biryara Rêveberiya Xweser ku 10'ê cotmeha 2020'an û li ser bingehê civîna bi QSD, Desteya Karûbarê Civakî û Desteya Karê Hundir, pêk hat
Beşa 12 ji 105 malbatan ( 345 kesan) ku ji bajarê Minbicê ne pêk tê.
Rêveberiya kampê da zanîn ku derbarê koçberên ku li kampê dimînin û ne ji bakur û rojhilatê Sûriyê ne, ti biryar nehatine standin. Herwiha diyar kir ku niha tenê malbatên bajarên bakur û Rojhilatê Sûriyê derdixin.
*ANHA*

# 8 leşkerên hêzên hikumeta Şamê û 21 çeteyên DAIŞê hatin kuştin



Li çolistana Sûriyê çeteyên DAIŞ`ê êrişî nuqte û bendên kontrolê yên komên alîgirên hikumeta Şamê kirin. Di encamê de 8 endamên wan koman hatin kuştin.
Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê (SOHR) ragihand ku çeteyên DAIŞ`ê nuqte û bendên kontrolê yên wan koman li deverên cuda yên çolistana Sûriyê kirin hedef. Di ser de balafirên Rûsyayê herêm bombebaran kir.
Li gorî SOHRê, di encama bombebarana balafirên Rûsya de, 21 çeteyên DAIŞ`ê hatin kuştin.

# Cenazeyên du şervanên QSD'ê bi merasimekê hatin veşartin



Cenazeyên şervanên QSD'ê Merî Cemîl Ebdullah (Udey Til Hemîs) û Sair Ehmed Debo (Kawa Tehama) bi merasimeke girseyî hatin veşartin.

Bi sedan şêniyên navçeya Til Hemîs, malbatên şehîdan, endamên saziyên sîvîl û leşkerî û nûnerên partiyên siyasî cenazeyên şervanên QSD'ê Merî Cemîl Ebdullah (Udey Til Hemîs) û Sair Ehmed Debo (Kawa Tehama) spartin axê. Herdu şervanên QSD'ê 18'ê Sibatê li ser erkê xwe li navçeya Til Birakê şehîd bûbûn.
Di merasima li Qamişlo de, ji fermandarên QSD'ê Harûn Apoyî axivî û wiha got: "Di dirêjayiya 10 salên şoreşa bakur û rojhilatê Sûriyê de faşîzma dewleta tirkî bi riya şandina çeteyên xwe hewl dide welatê me dagîr bike. Lê bi saya şehîdan têk çûn. Me ji cîhanê re nîşan da ku em bi pêşengiya şehîdên xwe têk naçin û radest nabin."
Dûv re endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Qamişlo Ebdulezîz Osman wiha got: "Şehîd meşeleya vê neteweyê û pêşengên wê ne ku asoyên paşrojê vedikin. Ji ber wê em bêjna xwe li hember wan ditewînin."
Piştî axaftinan, nasnameyên her du şehîdan hatin xwendin û radestî malbatên wan hatin kirin.
Pişt re hevalên şehîdan cenazeyê Sair Debo li Goristana Şehîdan ya Til Hemîs, cenazeyê şehîd Mirî Ebdullah jî li Goristana Şehîd Delîl Sarûxan ya Qamilo spartin axê.
*ANHA*

# Çeteyên DAIŞ'ê xwe ji nû ve zindî dikin

Li bajarokê El-Besîra yê li rojhilatê Dêrezorê, di encama teqîna motorsiklêtekê de, gelek sîvîl birîndar bûn.

Li gorî agahiyên ji herêmê hatîn bidestxistin, roja Şemiyê serê sibê li sûka bajarokê El-Besîra yê gundewarê rojhilatê Dêrezorê motorsiklêtek hat teqandin.
Li gorî agahiyan gelek windayî di nava sîvîlan de hene, lê jimara wan nehat zanîn.
Şaneyên çeteyên DAIŞ`ê li gundewarê Dêrezorê pirin û êrişan li dijî sîvîlan pêk tînin. Çeteyan berîya demekê gefa kuştinê li sîvîlan dikir. Şêniyên bajarokê El-Şehîl yê Dêrazorê, seriyê jêkirî yê kesekî nenas dîtin û li ser kaxiza pê re jî çeteyên DAIŞ`ê gefên kuştinê li welatiyan dikin. Ev kiryarên çeta fûkara ji nûve zindîbûna DAIŞ'ê çêdike.



# Dagîrkeran li Efrînê sîvîlekî din revand




Artêşa tirkî ya dagîrker li navçeya Reco ya Efrînê sîvîlek revand. Çeteyên bi navê Sultan Mûrad jî li bajêr bi dehan darên zeytûn û gozan birîn.


Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên girêdayî wê, Mihemed Mihemed Mûstefa yê li gundê Janjalî yê girêdayî navçeya Reco ya Efrînê revandin.
Koma çeteyan ya bi navê Sultan Mûrad ya girêdayî dewleta tirkî jî li navend û navçeyên Efrînê zêdetirî 75 darên zeytûn û gozan birîn.



# Hunermend çanda me diparêzin

**Hediya HISÊN/Qamişlo**







Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê 20ê Sibata 2021ê li Navenda Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo ji bo keda hunremend Faris Bavê Fîras ya bi salan di warê hunera Kurdî de, şahiya xelatkirinê li dar xist.
Şahiyê saet 4an dest pê kir û heta 6an dewam kir. Piraniya heskiriyên hunermend Faris beşdarî şahiyê bûn.
Endamê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê Aram Elî li ser mijarê wiha axivî: "Ev demeke me rêzeçalakî xistine bernameya xwe. Yek jê xelatkirina hunermendên jiyana xwe ji dest dane, ya duduyan xelatkirina hunemendên ku di warê hunera Kurdî de bi salan ked dane. Destpêkê me hunermend Faris Bavê Fîras vexwend. 36 kasêt ji berhemên wî hene. Helbestên Seydayê Tîrêj û Cegerxwîn xwendine. Zêdetirî 600 stiranê wî jî hene. Ev heyvek e em amadekariya vê şahiyê dikin. Me hunermend ji başûr vexwendin. Tevî ku tendrustiya wî ne baş bû jî em neşkandin. Li Rojava gelek rexne hatin ser me, digotin heta hunermendên me sax bin ti kes rêzê ji wan re nagire. Ji ber wê me hewl da pirtûkên hunermendan çap bikin û şahiyên xelatkirinê li dar bixin. Ev şahî ji gel re vekirî ye, kî dixwaze dikare beşdar bibe."
Aram axaftina xwe wiha qedand: "Desteya çandê her sal çalakiyên pêşangehên pirtûkan, pêşbirkên zarokan û mihrîcanên wêjeyê li dar dixe. Bi hêvî me her kes li çanda xwe xwedî derkeve."
Hunermend Fîras jî wiha axivî: "Em spasiya Desteya Çandê dikin ku îro bavê min hunermend Faris xelat kir. Çalakiyên wiha moralê hunermendan bilind dikin û dihêlin zêdetir li hunera xwe xwedî derkevin. Di dawiyê de jî spasiya hunermendan û Desteya Çandê dikim."

# Piştgiriya ciwanan erkê me tevan e




**Lêzan EBDIKÊ/Qamişlo**

Paşroja her welatî ciwanên wî ne. Di hundirê her ciwanî de galaksikeke ji raman, huner û azweriyê heye. Divê ew hemû ber bi riya rast ve werin meşandin ku di pêşkeftina civakê de were bikaranîn. Ji bo paşrojeke xweş divê em piştgiriya van ciwanan bikin.

**"PÊŞKETINA MIN XWEBIXWE BÛ"**

Dengbêjê ciwan yê bi navê Bilal Nûrî Yûsiv li ser serpêhatiya xwe wiha axivî: "Temenê min 24 e. Ez ji bajarê Qamişlo me. Ji piçûktiya xwe ve min ji stiranbêjiyê hes dikir, hem jî bandora bavê min li min dikir. Ji mer distirand û dengê wî jî pir xweş bû. Hestek bi min re çêbû ku hewl bidim ez jî xwe fêr bikim. Pişt re min ferq kir ku ev huner li gel min jî heye, lê hunereke veşartî bû. Lê ti kesî piştgiriya min nekir. Bi taybetî piştî mirina bavê min. Weke din derfet jî tinebûnn. Lê piştî ku mezin bûm min xwest dengê xwe bigihînim gel. Destpêkê tevlî koma Botan bûm. Lê min her tim dixwest taybetmediya min hebe û bi serê xwe bistirînim. Ji ber wê ji komê derketim."

**"DEV JI XEWNÊN XWE BERNEDIN "**

Yusiv axafina xwe ya li ser pêşketinê wiha qedand: "Pişt re min gava xwe ya herî mezin bi alîkariya Memdûh Elhac avêt. Ev kes bû peymankarê dengê min û min stirana xwe ya yekê berî salekê tomar kir. Bi rastî di dema niha de pir zor e ku mirov bi serê xwe stiranan tomar bike. Lewra pêdivî bi gelek pereyî heye. Herwiha ez bi du zimanan distirînim, lê stiranên tomarkirî hemû bi kurdî ne. Gelek projeyên min hene. Yek ji wan stiranek ji bo newrozê ye. Hêviya min ew e ku pirtir pêş bikevim û degê xwe pirtir belav bikim. Ji her ciwanê xwedîhuner re dibêjim dev ji xewnên xwe bernedin û dewam bikin."

# Ji MSD`ê Hefteya Çandê



Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) bi hevkariya Navenda Çand û Hunerê ya Reqa çalakiya "Hefteya Çandê ya Yekê " li Reqa da destpêkirin.

Hefteya Çandê ya Yekê roja Şemiyê dest pê kir û tê payîn ku 25'ê Sibatê bi dawî bibe.
Çalakiyên hefteya çandê bi beşdariya nûnerên Meclisa Sîvîl ya Reqa, şêx û rûspiyên eşîrên herêmê, nivîskar û rewşenbîrên bakur û rojhilatê Sûriyê li avayiya Navenda Çand û Hunerê ya bajarê Reqa dest pê kir.
Bernameyê bi rêzgirtinê dest pê kir. Pişt re endamê Komîteya Amadekar ya Hefteya Çandê Selam Hisên axivî û spasiya Meclisa Sîvîl ya Reqa kir ku ji bo vejandina çanda herêmê dixebite.
Paşê pêşangeha wêneyan ya şêwekarên Reqa û pirtûkan ku ji pirtûxaneyên herî kevin mîna Bor Seîd û Amara hatine komkirin, hat vekirin.
Dûv re Endamê Navenda Meda ya Lêkolînên Tundrew Mamoste Ebdulqadir Mûwehed axivî û pirtûka "El-Nebaha û Istihmar" ya nivîskarê Elî Şerîetî xwend û diyar kir ku nivîskar di aliyê doza çandê de gelek lêhûrbûn kiriye ku bal kişandiye ser taybetmendiyên civakî. Herwiha civakê pêş dixe û pirsgirêkan çareser dike.
Di hefteya çandê de wê rêzeçalakiyên çandî û hunerî li dar bikevin.
Tê payîn ku kurtefilimên ku xelata nobelê girtine werin pêşandan û semînereke bi ser navê "Bindestî û Berxwedana" ji aliyê MSD'ê ve were dayîn.
Herwiha wê şanoya "Siya Mêrekî" ya Deham El-Setam were pêşkêşkirin. Pişt re werşeya wênexêziyê ya zarokan bi navê "Em ji bo Aştiyê xêz dikin" bi çavdêriya Rêxistina Xitwe were lidarxistin. Herwiha wê Yekîtiya Rewşenbîrên Reqa semînerekê bi navê "Girtiyên di Sînemaya Erebî de" bide.
Di roja çaran de jî wê Navenda Çand û Hunerê ya Reqa şanoya bi navê "Gulên Sor Layiqî General in" ku derhêner Fîras Remezan e pêşkêş bike. Herwiha hin helbestvan wê bi hevkariya Platforma Mala Helbestan helbestan pêşkêş bikin.
Di roja pêncan de wê behsa Pirtûkxaneya Bûr Seîd di qada çandî ya li Reqa were kirin û xwediyê wê Ehmed El-Xabûr were xelatkirin. Pişt re ji aliyê Îbrahîm El-Xelîl ve wê semînerek were dayîn.
Tê payîn ku hefteya çandê roja 25`ê Sibatê bi encamname û şahiyeke hunerî bi dawî bibe.
*ANHA*

# Desteya Çandê hunermend Faris Bavê Fîras xelat kir



Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê ji bo xelatkirina hunermendê Kurd Faris Bavê Fîras li ser keda wî, li hola Mihemed Şêxo ya li bajarê Qamişlo şahiyek li dar xist.

Di şahiyê de heval û dostên hunermend Faris Bavê Fîras, endamên saziyên çand û hunerê yên bajarê Qamişlo û Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê amade bûn.
Di şahiyê de cîgirê hevserokatiya Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê Danîş Botan bixêrhatina mêvanan kir û diyar kir ku destkeftiyên heta niha bi dest xistîn wekîe çand, wêje, urf û adat berhemên keda şehîdan in û got, erkê me ye em li çand û li hunermendên xwe xwedî derkevin û ev soza me ye. "
Botan da xuyakirin ku barê huner û hunermendan giran e, lewre erkê wan e ku çanda xwe ya resen di nava civakê de belav bikin û wiha got: "Dema em dibêjin barê hunermendan giran e, pîvanên hunermendan hezkirin e, zihniyeteke baqij û xwedî wijdan in. Divê em li gorî pîvanên civakê hunera xwe bixin xizmeta civakê. Yek ji wan jî hunermendê navdar û pîroz yê xwediyê kedê Faris Bavê Fîras e ku ji 50 salî ve xizmeta çanda kurdewarî dike.
Pişt re rêveberiya Desteya Çandê xelat pêşkêşî hunermend Faris Bavê Fîras kir.
Hunermend Faris Bavê Fîras axivî û spasiya Desteya Çandê ya herêma Cizîrê kir.
Di dawiyê de Hunermend Faris Bavê Fîras çend stiranên xwe gotin.
*ANHA*

# Li Qamişlo mijara gelaş hê pirsgirêkeke mezin e




Avêtina gelaş li devê deriyan pirsgirêkeke pir mezin e. Hem bandorê li derdorê dike, hem zererê dide tenduristiya civakê. Gelo sedema vê civak e yan şaredarî erkê xwe pêk nayne? Derbarê mijarê de me nêrînên şêniyên Qamişlo girtin.
Welatiyê bi navê Heysem Şêxmûs Ehmed, wiha axivî: "Ez ji taxa Cûdî me. Erebeya gelaş hefteyê du rojan gelaşê taxa me kom dike. Lê ji ber ku em gelaş bi şev datînin ber deriyan heywan belav dikin. Şaredarî jî dibêje, serê sibehan daynin. Erebeyên gelaş serê sibehan saet pêncan digerin, gel jî wê saetê di xew de ye. Ji ber wê ev pirsgirêk derdikeve. Ev jî dibe sedema gelek nexweşiyan û bajar tev dibe qirêj. Şaredarî selikên gelaş li çend deverên sereke belav kirine lê li nava taxan nînin."
Heysem Şêxmûs axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo ku ti kes gelaş daneyne devê deriyan em bi hêvî ne şaredarî selikên gelaş li nava taxan jî belav bike. Bi wî awayî pirsgirêka me çareser dibe. Em spasiya şaredariyê dikin, lê em hêvî dikin ku vê salê gavên mezintir biavêje. Lê ne şaredarî tenê, divê gelê me jî li paqijiya bajêr xwedî derkeve."
Li ser rexneyên gel rêveberê beşa baqijiyê Mehmûd Simaîl Bekir ev nirxandin kir: "Ji bo baqijiya bajêr erebeyên me du rojan carekê li tevayiya taxan digerin. Li nava sûkê û li ser riyên sereke jî rojê sê caran, (şeşê sibehan, yekê nîvro û heftê êvarê) digerin. Riyên ku rojê sê caran tên paqijkirin ev in: Wihdê, Kornîş, Qietlî, Enteriyê û Siyahî. Nêzî 40 erebeyî û sê cakên me hene. Derbarê paqijiyê de divê gel jî xwe berpis bibîne. Me seleyên gelaş li ser riyên sereke danîne. Lê hê me li nava taxan dananîne. Karkerên me yên paqijiyê li sûkê û li ser riyên sereke, 24 saetan di tevgerê de ne."
Mehmûd Bekir axaftina xwe wiha qedand: "Em bi hêvî ne gel gelaşê xwe navêje devê deriyan û li paqijiya xwe balder bin. Bi taybetî di dema korona de pêwîst e em li teduristiya xwe miqate bin."

## "Me bîriya malên xwe kiriye"

**Dilîn EHMED/Qamişlo**




Sedema koçberiya bi hezaran malbatên Serê Kaniyê û Girê Spî êrişên dewleta tirkî û çeteyên wê ne.
Celîla Mistê ya ji bajarê Serê Kaniyê, (21) ya dayîka kurekî, li ser êrişên Tirkiyê û koçberiya xwe, wiha axivî: "Bi destpêka êrişan re em derketin. Saet 4ê êvarê em ketin ser rê, saet 10an em gihîştin gundê Zorbehiyê yê bajarê Amûdê. Ji ber ku xaniyên kirê bi dest me nediketin, em neçar man heyvekê li cem dostên xwe bimînin. Piştî wê me berê xwe da bajarê Qamişlo. Ji ber ku koçber pir bûn, li vir jî xaniyên kirê zûbizû peyda nedibûn. Dawiyê me xaniyek peyda kir û ji neçarî em çar mal tê de bi cih bûn."

**"DIVÊ RÊXISTINÊN MIROVÎ ALÎKARIYA ME BIKIN"**

Celîla axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li Serê Kaniyê ez endama Saziya Cemarik bûm. Piştî hatim vir bêkar mam. Hêviya min ew e ku li vir jî di heman karî de bixebitim. Lewra zarokekî min heye û hevjînê min karê rojane dike. Di qedexeya derketina derve de em bi hesreta nanekî bûn. Divê rêxistinên mirovî alîkariya koçberan tevan bike. Çimkî ji bilî cilên li ser me ti kesî nikarî tiştekî bi xwe re bîne. Pêdiviyên jiyanê yên mîna firax û cihnivînan, cîranan ji me re kom kirin, em spasiya wan dikin. Bi rastî tevî van zehmetiyan jî, ji bo xerabkirina planên dijmin em naxwazin ji welatê xwe derkevin."
Di dawiyê de, bi dengekî melûl, biêş û bi çavên tijî rondik, Celîla daxwaziya vegera xaka xwe kir.

## Xemgînî li pêşiya xwe nekirin asteng

**Leylan RESO/Qamişlo**




Dewleta tirkî ya dagîrker 9ê Cotmeha 2019an êrişî Serê Kaniyê kir û bû sedema koçberiya bi sedhezaran. Hin ji wan li kampan hatin bicîkirin, hin jî bi derfetên xwe li bajarên Rojava bi cî bûn. Zarokên Serê Kaniyê jî tevî zor û zehmetiyan jiyaneke nû ji xwe re afirandin.

**"ERDOXANÊ XWÎNMIJ LEYZOK Û CILÊN MIN TEV JI ZAROKÊ XWE RE BIRIN"**

Zaroka bi navê Nûr Umer Reso, (6) li ser koçberiya xwe wiha axivî: Ez û malbata xwe li Amûdê bi cî bûn. Erdoxanê xwînmij her roj gefan li me dixwe. Em di mala xwe de bûn, me tiştek pê nekiribû. Çima her dem êriş li ser me dibin? Dayîka min ji min re behsa koçberiya 2012an, kir. Ez pir tirsiyam, hêsirên min weke baranê dibariyan. Dayîka min ji min re got keça min emê rojekê vegerin bajarê xwe."

**"EZ BI DÛRBÛNA BAJARÊ XWE PIR XEMGÎN BÛM"**

Nûr Umer Reso di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Erdoxan cilên min hemû ji zarokên xwe re birin. Hem cilên kurdî yên sersalê, hem gelek leyzokên min birin. Dema em hatin Amûdê ne dost ne heval û ne jî leyzokên min hebûn. Ez bi dûrbûna bajarê xwe pir xemgîn bûm. Lê piştî demeke dirêj ez hedî bi bajarê Amûdê ve hatim girêdan. Çimkî hevalên min çêbûn û xwîşka min jî, ji min re leyzokên weke yên li Serê Kaniyê anîn. Di dawiyê de ez dibêjim na ji dewleta tirkî re. Na ji Erdoxanê xwînmij re. Na ji dewleta Osmanî re. Çi dibe bila bibe emê vegerin bajarê xwe."

**"XEMGÎNÎ LI PÊŞIYA XWENDINA MIN NEBÛ ASTENG"**

Birayê Nûr Mihemed Umer Reso jî (10) li ser koçberiya xwe wiha got: "Bi destpêkirina êrişan re me berê xwe da gundê Rîhanê yê Dirbêsiyê. Em li wir li mala bapîrê xwe man. Piştî demekê me dît ku şerê Serê Kaniyê dirêj kir, me berê xwe da Amûdê û em li wir bi cih bûn. Niha ez xwendekarê refa 4an im. Ez ji xwendinê pir hes dikim, min ne hişt xemgînî li pêşiya min bibe asteng."
Mihemed Reso bal kişand ser derketina ji bajarê xwe û axaftina xwe wiha domand: "Berî ku Serê Kaniyê bê dagîrkirin ji me re digotin ji malê xwe derkevin. Lê ji ber ku em bi xaka xwe ve girêdayî bûn me nedixwest em derkevin. Lê 9ê Cotmeha 2019an, li bajarê min bêdengî çêbûbû, te digot qey gelê me zanîbû wê rojê wê ji buhişta xwe derkevin."

**"TAMA XERÎBIYÊ TAL E"**

Reso axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "9ê cotmehê seat 4an du balafir hatin ser bajarê me. Balafira yekê li gundê Mişrafa xist. Em pir tirsiyan. Ji bo derketina ji bajêr tiştek tinebû. Lê pişt re em bi erebeya zaveyê xwe reviyan. Her ku me gavek diavêt bombeyek li pêşiya me diket. Ax û sed ax çiqas tama xerîbiyê tal e. Em ji bajarê xwe dûr ketin. Weke ku ruh û can dûrî hev bikevin. Hêvî dikim ku di demeke kin de em vegerin bajarê xwe. Çimkî min pir bîriya wir kiriye."

## Ma dolar bû hevjînê jiyana me

**Hediya HISÊN/Qamişlo**



Li bakur û rojhelatê Sûrî dolarekî emerîkî gihîştiye 3 hezar lîreyên Sûrî û bihayê pêdiviyan bi dolar ve hatiye girêdan. Xelk bi gazind in, êdî nikarin pêdeviyên xwe peyda bikin.
Em rojên xwe bi nanûzikê diqedînin
Derbarê mijarê de welatiya bi navê Nejla Cemîl wiha axivî: "Her ku diçe nirxê pereyên Sûrî beramberî dolar dadikeve. Em 7 kes di malê de ne. Hevjînê min karker e. Em debara malê bi zorê diqedînin. Zarokên me tama fêkî û şîranî ji bîr kirine. Xwarina me maye nan û xwerekên sereke û goşt jî bi heyvan em nabînin. Em bi şev û roj kar bikin ancax bikarin pêdeviyên malê biqedînin. Kirîna cilan jî bûye ji cejnê heta cejnê. Bi pereyên ji Ewropa ji me re tên em xwe diqedînin. Pere bêqîmet bûne, xwarineke bêgoşt bê çêkirin nirxê wê 20 hezar e. Bazirgan jî nirxê xwerek ser kêfa xwe difroşin, ti kes nîne pêşiya wan bigire. Banga min ji rêveberiya xweser re heye; divê li ser bihabûnê baş raweste."
Dema dolar biha bû min kirî
Xwediyê dikana cilan Mihemed Mehmûd jî wiha axivî: "Bihaya pêdeviyan ji me re bûye pirsgirêk. Pere bêqîmet bûne û her ku diçe qîmetê lîreyê Sûrî jî kêmtir dibe. Bazirgan dibêjin em xwerek bi dolaran dikirin û bi lîreyê Sûrî difiroşin. Ji ber wê biha ye. Dema dolar dadikeve jî nirxê xwerek erzan nakin, dibêjin dema dolar biha bû me hingê kirî. Lê ez jî bazirgan im û dizanim ev gotin derew in. Dema dolar biha dibe em pêdeviyan nakirin. Gelê me xizan e, ji ber bihabûnê zirareke pir mezin dibîne. Hêvî dikim ku Rêveberiya Xweser çareseriyekê bibîne yan jî fonê karkerên xwe bike bi dolaran."

## Destana Zapê li Garê hat updatekirin!



**Farûk SAKIK**

jI Fermandarên mezin, Şehîd Silêyman Aslan di axaftinek xwe de digot "Teqez e ku wê her kurdek zewqa vê êşa bi dewleta Tirk dayî tamkirin, bijî." Di vê êşê de em behsa kuştina însanan nakin. Em serkeftina gerîlla ya şer vedibêjin. Lewra di siyaseta dewleta Tirk de Garê bû bombe û bi faşîzma AKP û MHP'ê de teqiya. Gerîllayên Kurdistan li Garê êşek mezin bi dewleta Tirk dane tahmkirin û Kurdistanî bi vê yekê zewqek mezin jiyan.
Îro li Tirkiyê ji têkçûna; artêşa bi teknîka nûjen, bi îstixbarata herî pêşketî, bi destûr û ewlekariya dewlet û hêzên heremê, herkes hevdû berpirsyar dibînin. Bi rojan ji bo ku vê êşa xwe derman bikin, serî li hemû rêbazên şerê pîskolojîk dan. Medya wan jî dike nakê ji vê êşê re çareseriyek nabîne. Li ekranên wan hin kesên xwedênegiravê pirsporên şerin û di dest wan de darikek li ser, krokî, şema, anîmasyonan, dikin nakin nikarin serkeftinek sanal ji vê têkçûnê derxin.
Di şerê Garê de tu tiştek ku wek hêvî û plansaziyê birêve neçû. Mizginiya ku Erdogan behs kiribû pêk nehat. Dema ku roja çarşemiyê derket pêşberî kamereyan, li kêleka wî tu kesek ji pêşengê PKK'ê ku xeyalkiribû tunebû. Li kêleka wî, 3 ji wan fermandarê giranbûha 37 tabutên eskeran ( îstastîkên HPG'ê) û cesedê 13 dîlên şer yên ku bi kîmyasalê hatibûn kuştin hebûn. Bi êş bûn. Êşek mezin tahm kiribûn.
Ji bo êşa xwe jibîr bikin êrişî kurdan kirin. Êrişî HDP'ê û siyasetmedarên kurdan kirin. Hêna cesedên wan li erdêbûn êrişan destpêkir. Nêzikî 800 siyasetmedarên kurd hatin binçavkirin. Lê ji bo kurdan ne xem bû. Kurdistanî zewqa, êş dayina dewleta Tirk a dagirker dijiyan. Gerîlayên Kurdistan, Destana Zapê li Garê update kiribûn.
Kurd û dostên wan eva demek dirêj bû li benda destanek bi vî rengî bûn. Êrîş û dagirkirina Efrîn, Grê-Spî û Serêkaniyê ew demoralîze kiribûn. Gerîlla jî ev yek dîtibû û ji bo bersivê li benda biharê bû. Lê Bizinê hat nanê Şivan xar. Li Garê bihar zû destpêkir.
Demek dirêj bû kurd ji bo parastina şoreşa Rojava têdikoşiyan. Dewleta Tirk ji her milî ve êrîş dikir. Li Heftanîn gerîlla îşaretên serkeftina Garê dabûn. Ev yek di nav civaka kurdan de hêviyek mezin afirandibû. Dema li Garê darbeyên mezin li dewleta Tirk dan, êdî li her deverî Kurdistanî vegeriyabûn salên berê.
Li Rojava jî ev serkeftin hatibû silavkirin. Û ev silav dewleta Tirk pirr êşandibû. Wisa ku nuçegîhanê dewleta Tirk, li Emerîka, ji dewleta Amerîka pirsa vê silavê dikir.
Ji bo vê yekê, kurd li kuderê dijîn bila bijîn, dive gavek diha pêş ve herin û bibêjin; "PKK û Gerîlayê Kurdistan ji bo Kurdistanek azad têdikoşin. Bibêjin heger ev hêz tunebin wê Kurdistan wek ku dewleta Tirk dixwaze tunebibe." Haa, hûn van gotina bibêjin jî û nebêjin jî, wan ji bo pêşeroja we biryar girtine. Di vê biryarê de zîndan, îşkence û kuştin heye. Axaftin anjî bedeng mayina we, biryara wan naguhêrîne.
Yek tişt dimîne, dive tucaran ji gerîllayên Kurdistanê hêvî û baweriyê xwe qût nekin. Di serî de dewleta Tirk hemû dijminê kurdan li pey vê hêza kurdan a çekdarin. Dijmin ji me zêdetir bawerî di vê hêzê de dîtiye ku wê Kurdistanê azad bike. Ji bo vê yekê, ev hêz di hedefa wan a yekemîn de ye. Dive ji bo ku em, zewqa êş tahmkirina dewleta Tirk bijîn, gerîllayê Kurdistan wek roniya çavê xwe biparêzin.



# 'Gerîlayên jin li her deverê pêşengên şer bûn'

Fermandar Hêjar Zozan got, "Çalakiyên YJA Starê ne li Heftanînê tenê bûn. Li Xerza, Botan, Zagrosê û gelek cihên din hevalên jin bi xurtî tevlî çalakiyan bûn. Ji aliyê profesyonelbûna hevalên jin ve îsal pêngavên gelek cuda yên taktîkî pêş ketin."



Ji fermandarîya YJA Starê Hêjar Zozan ku tevlî civîna Konseya Fermandariyê ya HPG'ê bûy, di derheqê pratika YJA Starê û armanca sala 2021 de hevpeyvînek Bi ajansa anf re çêkir.

Zozan diyar kir ku YJA Starê bi çalakiya Sema Koçer a li Serhedê dest bi sala 2020'î kir û got, "Vê çalakiyê nîşan da ku sal wê bi çi rengî derbas bibe û Hevala Sema sala têkoşînê da destpêkirin."

**"HEVALA SEMA SALA TÊKOŞÎNÊ DA DESTPÊKİRİN"**

Fermandara YJA Star'ê Hêja dîyarkir ku di civîna Konseya Fermandariyê ya HPG'ê de pratika salekê çawa hat nirxandin, pratika YJAStar jî bi heman Nirxandinên xurt û berfireh hat destgirtin û wiha bal kişand ser pêşenhîya gerîlayê jin; "di sala 2020'î de milîtanên YJA Starê di şer de bi rola xwe rabûn û Pêşengên mîna Sema Koçer, Esmer û Zelal derketin holê. Salê bi çalakiya serhedê ya hevala Sema Koçer dest pêkir. Hevala Sema, sala têkoşînê da destpêkirin. Piştre li Heftanînê pêvajoyeke şer dest pê kir. Di Cenga Heftanînê de hevalên jin bi rola pêşengiyê rabûn. Bi taybetî yekîneya xweser a bi fermandariya hevala Esmer bandoreke xurt kir û li Heftanînê bi lehengî şer kir. Ji bo her kesî bû çavkaniya sûdwergirtinê. Bi taybetî li qada Serhildanê pêşketinên girîng çêbûn."

**"EV ÇALEKÊ DİVÊ WEK TOLHİLDANA JİNÊ BÊ NİRXANDİN"**

Zozan da dîyarkirin ku çalekîyên gerîlayên jin yên di salê de pêşketîn, heman deme ji bo tolhildana êrişa li ser jinê bû û gotinên xwe wiha bi lêv kirin; "Di vê salê de gelek çalakiyên hevalên jin pêk hatin û divê ev çalekî wek tolhildana jinê bên nirxandin. Ji ber ku dewleta Tirk a faşist li Kurdistanê, jin hedef girtin û teybet êrişî jinên ciwan kirin. Dest avêtin keç û zarokan. Ev çalakî di heman demê de hilanîna tola wan e. Lewma di bilindkirina têkoşînê û lidarxistina çalakiyan de roleke xwe ya diyarker heye."
Hêja destnîşan kir ku çalekîyên YJAStar ê ne tinê li heftanînê, li her deverên gerîlan, pêşengîya şer kiriye û wiha pêda çû; "Bi taybetî hevala Doga Zîlan hem bi rengê fedayî hem jî ji aliyê taktîkî ve di şerê hewayî ve bû pêşenga gerîla û bandoreke mezin kir. Ev hevalên me, bi pêşengê ya xwe mîrateyê serkeftina azadîyê ji me re dihêlin. Li ser vê bingehê di civîna me de jî asteke xurt hate bidestxistin. Di bingeha vê danhevî û tecrûbeyê, wezîfe ya ku di sala 2021'ê dikeve pêşîya me ewe ku divê em bi roleke mezin rabin û bi xurtî tevlî bibin."
Fermandara YJAStar'ê Hêja, dîyar kir ku piratîka heyê ne têrkere û ev yeke jî li hember rewşa ku Rêber Apo têde mijara reqnedayînê ye û destnîşan kir ku di vê civînê de Biryardayin a bilinkirina tekoşînê hat dayîn û wê ev biryar mohra xwe li sala 2021'ê bixe.
Ji fermandarîya YJA Starê Hêjar Zozan di davîya axiftina xwe de bang li jinên ciwan kir û wiha got; " YJA Star beriya her tiştî hêzeke jinan e. Li ku derê êriş li dijî jinê bê kirin, YJA Star wê li derê jinê diparêze. Heta ji destê me bê em ê vê yekê hîn bi xurtî pêk bînin. Lê belê divê jin ên ciwan jî hîn bêhtir tevlî nava refên gerîla bibin. Ji bo xwe xurt bike û li dijî êrişên faşîzmê bikaribe xwe biparêzi. Faşizm teybet êrişê kes û miletên bê parastin dike û divê jin jî bizanibe ku parastina wê ya cevherî YJAStar'e. Lewma eger jin xwe bi parastina xwe ya cevherî pêş bêxe ti hêz nikarin êrişê jin bikin. Ji bo vê jî bang li jin ên ciwan dikim ku tevlî nava refê YJA Starê bibin."

## Kongreyra Star dema çalakiyên 8`ê Adarê eşkere kir



Remziya Mihemed dema bernameya çalakiyên 8`ê Adarê eşkere kir û got; "çalakiyên 8'ê Adarê wê di çarçoveya qonaxa 2. ya pêngava 'Na ji dagîrkirî û qirkirinê re, bi hev re em jin û jiyanê biparêzin' de werin lidarxistin."
Kongra Star bi hevkariya rêxistinên jinan yên bakur û rojhilatê Sûriyê, 9`ê Kanûna 2020`an qonaxa yekê ya pêngava "Na ji dagîrkirî û qirkirinê re, bi hev re em jin û jiyanê biparêzin" dabû destpêkirin, heya 9`ê Çile berdewam kir.
Di pêngavê de, li ser sûcên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li dijî jinê bal hat kişandin, bang li jinên cîhanê hat kirin ku piştgiriyê bidin şoreşa jinê û kompIoya navnetewî, tecrîda li dijî rêber Abdullah Ocalan, şermezar bikin.
17`ê Çile qonaxa 2. ya pêngavê hat destpêkirin û tê payîn ku heta 17`ê Nîsanê dewam bike.
Bi pêmana 8`ê Adar Roja Jinan ya Cîhanê saziyên jinên herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bi pêşengiya Kongra Star, bi amadekariyên lidarxistin çalakiyan dikin.
Girêdayî mijarê berdevka Kongreya Star Remziya Mihemed ji ANHA re axivî.
Remziya Mihemed dîyar kir ku Kongreya Star di çarçoveya qonaxa 2. ya pêngava "Na ji dagîrkerî û qirkirinê re, bi hev re em jin û jiyanê biparêzin" de amadekariyên rêzeçalakiyên 8`ê Adarê Roja Jinan ya Cîhanê, dikin.
Remziya bi lêv kir ku di hefteya dawî ya meha Sibatê de wê li navçe û meclisên tevayiya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê semîner û panel werin dayîn.
Remziya Mihemed herwiha da zanîn ku ji 1`ê Adarê heta 21`ê Adarê wê rêzeçalakiyên cüda wê werin lidarxistin û wiha berdawamî da axiftina xwe "Wê ji bo rêber Abdullah Ocalan çalakî werin lidarxistin, herwiha wê meş werin lidarxistin û pêşangehên hûnerî li Qamişlo, Kobanê û Şehbayê wê werin vekirin, li bajar û navçeyan wê şahî werin lidarxistin."
Berdevka Kongreya Star Remziya Mihemed wiha dawî li axaftina xwe anî: "Em çalakiyên 8`ê Adarê ji bo bilindkirina asta têkoşîna jinan, ji bo wefedariya bi şehîdên ku ji bo azadiya jinan têkoşiyan û li ber xwe dan heta gihîtşin asta şehadetê, lidar dixin. Ji ber wê jî em çalakiyên 8`ê Adarê diyarî şehîdên azadiyê dikin."



## Jinwar berhema têkoşîna jinê ye

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**


Jinwar berhema têkoşîna jinê, civak û çanda xwezayî ye. Weke her devera li bakur û rojhilatê Sûriyê, li gundê Jinwar yê bajarê Dirbêsiyê jî nexweşxaneyeke bi navê "Şifaya Jin" heye. Li nexweşxaneyê dermanên xwezayî bi keda destê jinan tê çêkirin.

**"NEXWEŞXANE 24 SATEAN VEKIRIYE"**

Derbarê mijarê de rêvebera nexweşxanê Cemîla Şetê wiha axvî; " Nexweşxane 24 saetan vekirîye û nexweş ji her deverê tên xwe li vir tedawî dikin. Despêka nexweş tên em wan pêşewazî dikin. Li vir venêrîn û tedawî bê pareye. Lê despêka nexweş derbasî nexweşxaneyê dibin 500 lîreyên Sûrî dikin sûndiqa alîkarîyê de. Du beş li nexweşxaneyê hene, beşa xwezayî û beşa tibî. Di beşa xwezayî de dermanên ji xwezayê tên çêkirin hene, piranî em dermanên xwezayî bi kar tînin. Ji bo venêrîna jinan jî cihê zayînê jî heye."
Cemîla dîyar kir ku heft endamên wa li gel bijîşkek pispor hene.

**AWAYÊ KAR DI REWŞA KORONA DE**


Cemîla bal kişand ser despêka nexweşiya korona û got; "Di rewşa korona de kesê derbasî nexweşxaneyê dibûn berdev û lepik bi kar tanîn. Wê demê me gelê xwe hişyar dikir û me gelek perwerde li ser xweparastina ji nexweşiyê didan gundên derdora jinwarê. nexweşên ku korona bi wan re xûya dikir, me ew dişandin nexweşxaneya dirbêsiyê"

**"JINWAR BERHEMA TÊKOŞÎNA JINÊ YE"**

Cmîla di berdawamî ya axiftinên xwe dîyar kir ku di cîhanê de jîyana mirov bi tekoşîna jinê hat avakirin û got; Ji bo ku em xwedî li keda tekoşîna jinê derkevin, emê xebat û tevgera xwe bidomînin û Jinwar jî berhema têkoşîna jin, civak û çanda xwezayî ye."
Rêvebera nexweşxanê Cemîla Şetê di dawîya gotinên xwede dîyar kir ku Desteya Tenduristyê ya Herêma Cizîrê hertim alîkariya wan dike û heman demê de jî Heyva Sor ya Kurdî di avakirina nexweşxana Jinwar de bûye alîkar.

## Mihrîcana Huner û Wêjeyê ya Jinan bi dawî bû



Çalakiyên Mihrîcana Huner û Wêjeyê ya Jinan ya 3. li bajarê Minbicê bi dawî bû. Mihrîcanê roja Şemiyê dest pê kiribû.
Mihrîcan li hola Navenda Çand û Hunerê ya Minbicê hat lidarxistin. Di mihrîcanê de stiran û şano bi beşdarbûna pêkhateyên Kurd, Ereb, Çerkes û Tirkmen hatin pêşkêşkirin
Jinên ji Dêrezorê, endamên Koordînasyona Kongreya Star ya bakur û rojhilatê Sûriyê, jinên ji Reqa, Tebqa, Kobanê û dayîka şehîd Hevrîn Xelef yadê Sûad Mistefa jî beşdarî mihrîcanê bûn.
Di roja duduyan ya mihrîcanê de stiran, helbest, şano hatin pêşkêşkirin. Koma Kevana Zêrîn ya bajarê Kobanê bi navê "Keda Jinan" lîstekeke şanoyê pêşkêş kir. Herwiha helbestvan Heya Welîd El-Îsa helbest xwendin.
Koma Minbicê ya şanoyê jî şanoyek bi navê "Jina ku namire" ku behsa berxwedan û têkoşîna jinan dike, pêşkêş kir.
Di dawiyê de komên beşdarî mihrîcanê bûyîn, ji aliyê komîteya amadekar ve hatin xelatkirin.

# Siyasetmedar: Divê ENKS dewleta tirkî dewleteke dagîrker bi nav bike

**Siyasetmedarên Kurd yên Rojava gotin, divê ENKS dewleta tirkî dewleteke dagîrker bi nav bike, da ji bo yekîtiya neteweyî ya kurdî gav werin avêtin.**

Siyasetmedarên Rojava diyar kirin ku gavên destpêkê yên ji bo serxistina insiyatîfa yekîtiya kurdî ew e ku ENKS dev ji hişmendiya xwe berde û dewleta tirkî dewleteke dagîrker bi nav bike.

Serokê Yekîtiya Lîberal ya Kurdistanê Ferhad Têlo got, ji destpêka 2011`an heta roja îro sedema serneketina insiyatîfa yekîtiya kurdî ew e ku serokên partiyan berjewendiyên xwe di ser berjewendiyên gelê Kurd re digirin û ya herî girîng ew e ku biryarên pirraniya partiyan ne di destên wan de ne.”

Têlo da zanîn ku sedema serneketina yekîtiya kurdî, Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) ye ku her carê şertên nû derdixe.




Endamê Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Faris Osman jî tev li nêrîna Ferhad Têlo bû ku partiyên siyasî yên kurdî divê dev ji berjewendiyên xwe yên kesayetî berdin û ji bo xizmeta gelê Kurd tev bigerin. Her wiha da zanîn ku hêviya wan bi tevgera siyasî heye ku di vê qonaxa hestiyar de yekîtiya kurdî ava bike.

Çalakgera siyasî Leyla Siwar jî da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker isbat kir ku hebûna wê li ser bingehê qirkirina gelê Kurd e û stratejiya xwe jî li gorî wê ava kiriye. Ji ber wê divê partiyên kurdî rastiya vê baş bizanin..

Siyasetmedar Hêvîn Reşîd jî got, gelê Kurd her tim xizmeta gelê din kiriye, lê niha ev cara yekê ye ku gelê Kurd ji bo doza xwe xebatê dike, ev jî bi serê xwe serkeftinek e. Hêvîn Reşîd got, divê ENKS`ê dev ji hişmendiya xwe ya ku yekîtiya neteweyî ya kurdî asteng dike berde.

## Armanc; ne tenê HDP'yî, HDP'ê jî bixin zîndanê



**Ahmet Aktaş**

Hewldanên AKP'ê yên vê dema dawî, hemû ji bo hilbijartina pêşwext e. Bê gûman di hevsengiya siyaseta Tirikiyeyê de HDP bûye kilît. Bi gotinek din, qedera desthilatiya AKP'ê, di kesayateya HDP'ê de, ketiye destê Kurdistaniyan. Ji mînaka hilbijartinên 7 ê Hezîrana 2015'an tirsiyan e, hinek mafdar in jî, lewra HDP'ê di vê hilbijartinê de ew ji desthilatiyê xist.

Li goreyî mejiyê R.Erdogan, vê carê ne bi tenê reveberên HDP'ê bixin zîndanê, belê HDP'ê bi xwe jî weke partî, hemû tabela û xaniyên wê dorpêç bikin- negrin, zîndanî bikin- ew ê karibe di hilbijartinê de bi serkeve.

Hilbet piştî hilbijartina 7'ê Hezîranê, çawa provakasyon û komkujî lidarxistin; li Serêkaniyê, li Pirsûsê, li Enqerê û hwd.û çûn hilbijartina 1'ê Mijdarê, heman siyaseta qirêj, ew ê hîn girantir bidin xebitandin. Eger di van hewldanên qirker de xwe serkeftî bibînin, hema herî nêz ew ê biçin hilbijartinek pêşwext.

Di êrîşa ser GARÊ de jî, yek ji armanca wî ya sereke ev bû. Ji ber ku di hilbijartine asayî ya 2023 de nikare bibe berendamê serokatiyê, zagon ji bo cara sisiya rê nadê. Lewma bi lezgînî ketiye pey serkeftinek nêz. Eger şerd û mercên hundur û derve, rê û destûrê bide wî, qed teqsîr nake ji bo her êrîşkariyê qîrkirinê. Ji bo temenê desthilatiya xwe dirêj bike, çavê xwe li her rûmetê mirovahiyê digre û weke dîhn û haran dikare êrîşî her tiştî bike.

Lê divê mirov bîne bîra wî-wan, dikarin bi hezaran rêvber û endamên din jî yên HDP'ê û dilsozên Tevgêra Azadiyê bigrin bixin zîndanan, ji xwe bi deh hezaran nuha girtî hene û dikarin HDP'ê jî weke partî bixin zîndanê, bes nikarin wê bîr û bawerî û hişmendî, wê felsefeya wî fîlozofê ku wan xistiye zîndana Imraliyê, ji dil û mejiyê kesî derxin û bixin zîndanê. Hîn zîndanek wisa li ser rûyê cîhanê nehatiye dîtin!

Li goreyî R.Erdogan û şefên wî yên cîhanî, eger Rêberê wê bixin zîndanê, êdî ev tevgêr bê serî dimîne û ev doz dimre!

Na xêr wisa nebû û nabe jî. Ew bîrdozî; bû hişmendî û bû îrade, di dil û mejî û ruhê gel û civakê de cihê xwe qayim kir. Li pey wê bû partî û rêxistin û sazî û dezgehên pir reng; bû muxtar, bû şaredar, bû parlementer û bû şoreş û hîn jî dewam dike û pêşî nikare lê were birîn!

Jiber ku pir şax veda û belav bû. Ne li çar parçeyên Kurdistanê; li Qendîl, li Garê, li Şingalê, li Mexmûr, li Rojava û hwd.tenê rawestiya, çû qada cîhanê.

Êdî planên nuh ên di çarçova salvegerên 15'ê Sibatan, 9'ê Cotmehan nema bi kêr tên. Ji ber ku êdî gel û Tevgêra Azadiyê bi hemû fêlbazîyên we yên gemar hesiyane û pûç dikin. Êdî salvegerên van rojên reş, ew ê veguhezên rojên tolhildanê û rojên geş û xweş.

## Berpirsekî dewleta tirkî mikur hat: Komkujiya Parîsê oprasyoneke dewletê bû



Piştî mikurhatina berpirsekî Tirk li ser Komkujiya Parîsê, KCDK-E û TJK-E bang li hikumeta Fransa kirin ku vê mikurhatinê delîleke şênber qebûl bike û dosya komkujiya Parîsê ji nû ve veke.

Serokê berê yê Daîreya Istixbaratê ya Fermandariya Giştî ya Artêşa tirkî Îsmaîl Hakki Pekîn, 16'ê Sibatê di kanala CNN Turk de beşdarî bernameyekê bû û got, divê êriş li dijî rêveberên KCK'ê bên kirin.

Îsmaîl Hakki Pekîn bi vê gotinê li komkujiya Parîsê mikur hat; “Li Ewropayê jî rêveberên wan hene. Divê em tiştekî bînin serê yên li Ewropayê. Yanî berê li Parîsê hatibû kirin, belê...”

Li Parîsê 9'ê Çileya 2013'an ji damezrînerên PKK'ê Sakîne Cansiz, Nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan û endama Tevgera Ciwanên Kurd Leyla Şaylemez hatibûn kuştin. Di lêpirsînê de pêwendiya MÎT'ê ya bi komkujiyê re eşkere bûbû û tevlî idîanameyê hatibû kirin.

KCDK-E û TJK-E bi daxuyaiyekê bal kişandin ser vê mikurhatinê û di serî de Fransa bang li hikumeta Ewropa kirin ku berpirsyariya xwe pêk bînin.

Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: “Hikumet Fransa divê vê mikurhatinê tavilê delîleke şênber qebûl bike û dosya komkujiya Parîsê ya hatî girtin ji nû ve veke, ronî bike û pêşî li wê yekê veke ku di serî de Tayyîp Erdogan sûcdar hemû li dadgehên navneteweyî bên darizandin. Piştî vê mikurhatinê divê welatên Ewropa li hemberî gefên dewleta tirkî ya faşîst yên li dijî kurdistanî û tirkiyeyiyên li Ewropa helwestê nîşan bidin. Bi navê KCDK-E û TJK-E bi vê wesîleyê em careke din bang li hikumeta Fransa dikin ku berpirsyariya xwe pêk bîne. Têkoşîna me ya azadî, wekhevî û demokrasiyê ya li dijî faşîzma AKP-MHP'ê bi biryardarî dewam bike.”

***ANHA***

## “Serkeftina Garê serkeftina Kurdistanê ye”

**Dilîn EHMED/Qamişlo**

Ji 10ê Sibatê ve dewleta tirkî ya dagîrker êrişî çiyayê Garê dike. Gelo armanc ji van êrişan çi ye? Piştî şkandina dewleta tirkî di Garê de, wê çi planên nû hebin? Dewleta tirkî her tim gelê Kurd dike hedef, ji bo têkbirina planên dewleta tirkî, divê gelê Kurd çi bike?

**GELO ARMANCA WAN PÊK HAT YA NA?**

Endamê Ofîsa Ragihandin û Lêkolînan ya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Welat Seidûn, li ser vê mijarê ev nirxandin kir: “Ji 10 heta 14 Sibatê êrişên dewleta tirkî ya dagîrke li ser Garê dom kirin. Bi berxwedaneke bêhempa gerîlayan, ev êriş têk birin. Berî ku êriş dest pê bike, Erdoxan ji miletê xwe re digot; ezê di demeke nêz de mizgîniya serketinê bidim we. Armanca wî rizgarkirin yan kuştina esîrên di destê gerîla de bû. Lê ji ber ku di rizgarkirina wan esîran de hat şkandin, ji neçarî ew kuştin. Ji bo fitneyê û veşartina xwe, Ajansa Anadol nûçeyek belav kir ku destê pêşmergeyan jî di kuştina wan de heye. Jixwe reşwa Erdoxan li Tirkiyê li ber çavan e ka gihiştiya çi astê. Partiyên li dijî Erdoxan û siyaseta wî li Tirkiyê hartir bûne. Çimkî krîza ku li wê derê çêbûye, ji ya Sûriyê jî kampaxtir e. Ji ber wê dixwest li Garê bi ser bikeve û dagîrkeriya xwe li Kurdistanê berfireh bike.”

**GARÊ KILÎTA KURDISTANÊ YE**



Welat Seidûn axaftina xwe wiha domand: “Planên dewleta tirkî yên ji bo tinekirina gelê Kurd, dewam dikin. Gelek kes dibêjin serkeftina Garê serkeftina hêzekê ya, lê ya rast ew e ku serkeftina Kurdistanî ye. Çimkî Garê xeta parastinê ye, eger Garê bihata dagîrkirin wê Mexmûr, Şingal, Başûr û Rojava bi hêsanî bihatan dagîrkirin. Eger heta niha Başûr li hemberî van êrişan helwestê xwe diyar nekiribe, pirsgirêk e. Lewra dagîrkirina Garê rê li pêşiya dagîrkirina Kurdistanê tevê vedike. Dewleta tirkî bi hiceta PKKê gelê Kurd tine dike. Li hemberî van hicetên faşîst, ji bo têkbirina planan divê siyasetmedar, rewşenbîr û gel bi taybetî destekê bidin hêzên xwe û piştgirya wan bikin.”

**DI YEKÎTIYÊ DE HÊZ HEYE**

Endamê Ofîsa Ragihandin û Lêkolînan ya PYD`ê Welat Seidûn axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Di rewşeke wiha hestiyar de, ya herî girîng û pêwîst parastina xakê û avakirina yekîtiya Kurdî ye. Jixwe em Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) heta asta dawî piştgirên yekîtiya Kurdî ne. Lewre ya rê li pêşiya êrişan bigire yekîtî ye.”



# Kujerê Seida û Hindê: Tirkiye destekê dide me

**Kujerê Seida El-Hermas û Hind El-Xidêr hûrguliyên vî sûcî eşkere kirin û diyar kir ku deweleta tirkî destekê dide wan.**

Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di operasyona tolhildana şehîd Seida û Hind de ku 4'ê Sibatê dabûn destpêkirin û 14 Sibatê temam bû , yek ji qatilên Hevseroka Meclisa Bajarokê Til-El-Şayir ya navçeya Deşîşa Seida El-Hermas û Hind El-Xidêr girtin. Di çarçoveya operasyonê de, QSD, YPJ/YPG, Hêzên Ewlekariya Hundir bi ser bi dehan baregehên şaneyên DAIŞ'ê de gitin. Di encamê de 87 çete girtin, ku di nava wan de qatilekî şehîd Seida û Hind yê bi navê Îbrahîm Ebdulrezaq (Hetler) jî hebû.

Çete Îbrahîm Ebdurezaq di mikurhatinên xwe de behsa tevlîbûna xwe ya nava çeteyên DAIŞ'ê de dike û diyar dike ku çeteyekî DAIŞ'î bi riya cil û şeklê wî nas kir “Kirasekî kurt li xwe dikir, ji dema ku min ew dît, min dewlet jî nas kir.”

Çete wiha didomîne: “Gelek caran min ew li dikaneke parçeyan didît, min hejmara telefona wî girt û pêre têkilî danî. Min jî xwest ku wî careke din bibînim û min ew dît. Min jê re got dixwazim tev li we bibim. Lê armanca min qezenckirina pereyan bû.”

**HÛRGULIYÊN KUŞTINÊ**

Têkildarî sûcê kuştina Hind û Seida, çete wiha parve dike: “Dem ber êvarî bû, Ebû Umer bi telefonê bi min re axivî, agahî da min ku kesek girêdayî wan e bi navê Ebû Osman wê li gel min biaxive, lê min jî re got çalakiya sêyemîn a ku ez bikim ji bo wan e, lê heger werin naskirin, wê çawa bibe?”



Bersiv da got: “ Xema nexwe, rêxistina me ya sereke li Tirkiyê ye, fermandarên me hemû li Tirkiyê ne, biryar û ferman û destek hemû ji wir tên. Heger tu werî eşkerekirin emê te birevînin Tirkiyê û wê maleke te li wir hebe.”

Çeteyê bi navê Îbrahîm Ebdurezqa Hetler wiha dewam kir: “Talîmat û destek ji Tirkiyê tên. Soz dabûn min ku 150 dolarî bidin min, lê heta niha min tiştek nedane. Min çiqas ji Ebû Omer pirs dikir, digot hîna pere nehatine.”

## “Armanca dewleta tirkî siyaseta Tirkkirinê û parçekirina herêmên dagîrkirî ye”

Rêveberiya Komîteya Perwerdeyê ya kantona Girê Spî, Salih El-Hecî got armanca dewleta tirkî ya perwerdeya bi zimanê tirkî li herêmên dagîrkirî siyaseta Tirkkirinê û parçekirina van herêman ji Sûriyê û girêdana bi serweriya Erdoxan ve ye.

Endamê Komîteya Perwerdeyê ya kantona Girê Spî Salih El-Hecî bal kişand ser siyaseta dewleta tirkî ya tirkkirinê li herêmên dagîrkirî û wiha got: “Armanca dewleta tirkî ew e ku herêmên dagîrkirî ji xaka Sûriyê qut bike û bi Tirkiyê ve girê bide. Vê jî li ber çavê civakên navneteweyî pêk tîne.” Dewleta tirkî li herêmên dagîrkirî siyaseta perwerdeya bi zimanê Tirkî di dibistanên wan herêman de dimeşîne û ala Tirkiyê li ser dibistanan bilind dike.

Têkildarî mijarê Salih El-Hecî diyar kir ku dewleta tirkî bi siyaseta Tirkkirinê hewl dide ku bingehê mercên guncaw ava bike da ku herêmên dagîrkerî tevlî desthildariya Erdogan bike. El-Hecî da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker ji bo pêkanîna siyaseta xwe meteryalên xwe dixe dibistanên herêmên dagîrkirî, alên xwe li ser dibistanan bilind dike û leyzok û balonan li zarokan belav dike.



## Komîteya Perwerdeyê ya KCK'ê bi pêmana Roja Zimanê Dayîkê daxuyaniyek weşand

Komîteya Perwerdeyê ya KCK'ê daxuyaniyek bi pêmana 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê da û banga xwedîderktina li zimanê xwe li gelê Kurd kir.


Komîteya Perwerdeyê ya KCK'ê 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê di serî de li şehîdên azadiyê û rêber Abdullah Ocalan pîroz kir û da xuyakirin ku ziman ji bo gelan amûra herî girîng ya jiyandina nasname û çanda xwe ye.

Komîteya Perwerdeyê diyar kir ku li gorî daneyên UNESCO ji sedî 40'ê serjimara cîhanê ji perwerdeya bi zimanê dayîkê bêpar in, 2 hezar û 474 ziman bi metirsiya tinebûnê re rûbirû ne û ji sala 1950'yî ve 230 ziman ji navê rabûne.

Di dewama daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Modela perwerdeya Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo gelên ku li herêm û cîhanê têkoşîna hebûn, nasmane û ziman dikin, mînaka herî bêhempa ya heza cewherî û vîna cewherî ye. Nîşana herî bihêz ya esasgirtina wekhevî, azadî, mafê zarokan, demokrasî û mafê mirovane û li hember jiyana li ser me hatî ferzkirin isbata pêkanbûna jiyaneke din, jiyaneke pirzimanî û pirçandî ye.”




## Dixwestin li Garê bi cî bibin lê gerîla destûr neda



**Zekî BEDRAN**

Hikumeta Erdogan-Bahçelî ya faşîst encama dixwestin li Garê bi dest nexist. Tersê wê derb xwarin û esîrên dixwestin rizgar bikin jî kuştin. Bêguman derdê wan ne rizgarkirina esîrên di destê gerîla de tenê bû. Dixwestin li Garê ku ji bo gerîla ciyekî stratejîk e bi cî bibin. Berxwedana gerîla ev plan xerab kir. Lê hêzên dagîrker herî kêm dixwestin esîran bibin Enqere û ji bo hikumeta faşîst bibe serkeftin. Piştî ku ev nebû xwestin partiyên hember li dijî PKKê û Kurdan bikin dijber. Lewre hikumet fêrî vê bûbû. Bi durişma “Têkoşîna li dijî terorê”, “Yekîtiya Tirkiyê” li hemberî Kurdan tev bi kar dianiyan û di eniya şer de digihandin hev. Lê vê carê wisa nebû. Partiyên hemebr hikumet rexne kirin û jê re gotin, tu berpirs î.

Erdoganê faşîst û şagirtê wî Suleyman Soylu dîsa gef li Kurdan xwarin û soza dagîrkerî, xwîn û mirinê dan. HDP ku li meclisê partiya mezin ya 3. e, bû amanc. Xwestin bi alîkariya ragihandinê û bi kampanya şerê psîkolojîk ji berpirsiyariya xwe birevin, hedefê şaş nîşan bidin û bi wî awayî Kurdan biperçiqînin, partiyê jî bixin rewşeke wisa nikaribe bixebite.

Gotin, milîtan herî zêde li Rojava ne. Çawa ku berê jî her tim dubare dikirin, dîsa gotin, heta ku terorîstek hebe emê şer bikin. Bi vî awayî Rojava jî xistin nava plana xwe. Tişta digotin li pêşberî ragihandinê diyarkirina qirkirinê bû. Jixwe vê eşkere dibêjin. Ji Kurdan natirsin, şerm nakin û nirxên mirovî avêtine keviyekê. Her tişta wan li ser zordariyê ye. Endama NATO ye û artêşeke wan ya mezin heye. Herwiha bi gelek dewletan re itîfaq kirine. Lê Kurd ne di nava itîfaqan de ne, bi serê xwe ne, lê wan bixe heta tu dikarî! Eger ne wisa bûya Erdogan li NY nexşeya ji Efrîn heta Dêrikê nîşan nedida û nedigot, emê Kurdan ji wir derînin Ereban û bermayiyên çeteyan li wir bi cî bikin. Li NY mirovek ranebû negot, di nava erdê gelekî din de tuyê çawa vê plana qirkirinê bikî.

Erdoganê faşîst li Idlibê çeteyên El Nusra ku dinya wan terorîst qebûl dike, diparêze. Bi wan re itîfaqê dike û dagîrkirina erdê Sûriyê didomîne. Li ser erdê Iraqê bi dehan baregehên leşkerî ava kirine. Emerîka û NATO piştgiriyê dikin û çavê xwe jê digirin. Di nava sînorên Tirkiyê de hê jî zimanê bi dehmilyonan Kurdan qedexe ye. Ew bixwe her tim behsa girîngiya ziman dikin û pîrozbayiyan dikin. Lê dema dor tê ser Kurdan, hebûn û naskirina mafê siyasî li aliyekî, mafê wan yê herî xwezayî qedexe dikin. Vê jî li ber çavê dinyayê dike. Bi cesareta ji vê bêdengiyê digirin ne li Tirkiyê tenê, bi dengekî bilind dibêje, ezê Kurdên li Iraq û Sûriyê jî tine bikim.

Nûnerên hikumeta tirkî ya faşîst, dibêjin kî çi dibêje bila bêje, bedelê wê çi dibe bila bibe, emê nehêlin li Sûriyê Kurd statûyekê bi dest bixin. Evqas harbûn, evqas nijadperestî, evqas dijminî enceq di serê faşîstan de hebe. Her sal bi sedhezaran ciwanên Kurd ji xwe re dike leşker, li dibistanên xwe dide xwendin, bi karmendî dixebitîne, keda wan dixwe, sererd û binerdê wan talan dike. Bi van tê nabe, dixwaze canê wan jî bistîne.

Ser çil salî re ye gelê Kurd li ber xwe dide. Niha Rojhilata Navî, bi taybetî li Sûriyê Ereb, Asûrî-Suryanî vê dagîrkeî û zordariyê red dikin. Eger gel li ber xwe bidin wê dawiya faşîzmê were. Aqûbeta yên weke Hîtler û Mussolînî, yên pişt wan re û ya Sedam li holê ye.